Peykerên Bajêrî

Ehmedê xanî

Bilind Mihemed

Zarokên delal..

Di vê goşê de, dê bizavê keyin çend peykerên di nav bajêrê Dihok de li serên filka û sêrîyana hatîn danan bo heweyên xoştivî bidîn naskirin, ku her êk ji wan giringîyeka mezin heye.

Êk ji wan peykeran jî, peykerê Ehmedê xanî ye. Gelek ji hevalên me yên zarok dibêjin ev nave min yê guh lêbûy, belê ew kî ye? Û boçî peykerek bo hatî ye çêkirin û filkeyek li nav bajêrî bi navê ûye?

Zarokên delal..

Dê bo hewe yên xoştivî bêjîn ka Ehmedê xanî kî ye?

Ehmedê xanî zanayekê mezin û êk ji rewşenbîr û feyilesofên milletê kurd e. Navê wî (Ehmed lîyas rustem) e û ji eşîra (xanî) yane.

Li bajêrê (bayezîd) ji dayikbûye û li mizgefta (Miradî ye) xwandî ye û li (exlat, urfe û bitilîs) xwandina xwe temam kirî ye û sera (bexda û misrê) daye.

Dîroka bûna wî, wekî ew bi xwe dibêjit:

Lewra ku dema ji xeyib fek bû
Tarîx hizar û şêst û yek bû